ŞIROVEYA HEQÊN WE

Eger hûn **BINÇAV NEBÛNE** û biryar e wekî gumanbar pirsan ji we bikin

1. Maf û heqê rawêjkariyeka veşartî bi parêzerekî an arîkariyeka hiqûqî ra li dema hevpeyvînê

A. Kingê?

- Beriya hevpeyvînê maf û heqê we yê rawêjkariyeka veşartî bi parêzerekî û li dema hevpeyvînê jî mafê arîkarekiya hiqûqî heye.
- Eger sûcên ku hûn bo wan tên hevpeyvînkirin cezayê wan ê zîndanê hebe, darizadinên li gorî C. bi kar tên.

B. Kîjan parêzer?

- Hûn dikarin parêzerekî bi dilê xwe hilbijêrin.
- Hûn anegorî hin şertên qanûnî dikarin daxwaza parêzerekî li gorî pergala arîkariya hiqûqî bikin ku bi giştî yan beşek ji wê bê dirav û belaş e. Hûn dikarin daxwaza formekî bikin ku şertên arîkariya hiqûqî diyar dike. Hûn dikarin ji nivîsgeha Encumena Parêzeran bo diyarkrina parêzerekî arîkariyê bixwazin.

C. Rawêjkariya veşartî çawan pêk tê?

Eger vexwendinnameyeka nivîskî ji we ra hatibe şandin, mafên li gorî hejmarên 1 heya 4 diyar dike û dibêje ku hûn dikarin beriya hevpeyvînê bi parêzerekî ra rawêjkariyê bikin:

- Ji ber ku berê derfeta we ya rawêjkariyê bi parêzerekî ra hebûye, lewma êdî careka din bi paş da nayê avêtin.
- Eger hûn hez nekin parêzerek arîkariyê bide we, divê ji we ra were gotin beriya destpêkirina hevpeyvînê bêdeng bimînin (Herwiha li xala 3 binêrin).

Eger vexwendinnameyeka nivîskî ji we ra nehatibe şandin yan vexwendinnameya nivîskî nîvcî be:

- Hûn dikarin tenê carekê daxwaz bikin hevpeyvîn bo rojeka din bi paş ve were avêtin bo ku hûn bikaribin bi parêzerê xwe ra rawêjkariyê bikin.
- Hûn dikarin bi telefonê bi parêzerê xwe ra biaxivin û piştî wê hevpeyvîn dikare dest pê bike.
- Hûn dikarin li ciyê hevpeyvînê li benda parêzerê xwe bimînin.

D. Arîkariya hiqûqî li dema hevpeyvînê

Parêzerê we dê misoger bike:

- ku mafê we yê bêdeng mayînê û mudaxile nekirinê parastî ye
- awayê tevgerîna bi we ra li hevpeyvînê, çi bikevin bin zexta nedurist an na;
- ev rastiya ku mafên we ji we ra hatine şirovekirin û rêkûpêkbûna hevpeyvînê.

Eger parêzerê we li bara her yek ji van mijaran nêrînên wî/wê hebin, ew dikare wan li axaftina hevpeyvîna polîs bide tomarkirin. Renge parêzerê we daxwaz bike lêkolîneka taybet were kirin yan kesekî taybet were hevpeyvînkirin. Renge parêzerê we daxwaza zelabûnê li bara pirsên tên kirin bike. Ew izna wî tuneye li şûna we bersivan bide yan pêşiya hevpeyvînê bigire.

E. Dev ji vî heqî berdan?

Hûn neçar nînin bo rawêjkariyê yan arîkariya ji parêzerekî daxwazê bikin.

Hûn dikarin pişti venêrîna pêwîst, bi dilê xwe dev ji vî heqî berdin, eger:

- hûn li emr û temenê qanûnî ne;
- pişti ku we îmze kir û belgeyek bo wê nîşan da.

2. Danûstandina kurt a sûcan

- Mafê we ye bi kurtasî ji we ra bibêjin ka bo kîjan sûcan hevpeyvîn tê kirin.

3. Heqê bêdeng mayînê

- Tu caran nikarin we mejbûr bikin xwe sûcdar bikin.
- Piştî ku we xwe da nasîn, renge hûn bixwazin daxuyaniyekê bidin, bersiva pirsan bidin yan jî bêdeng bimînin.

4. Heqên din li dema hevpeyvînê

Hevpeyvîn bixwe bi hin danûstandinan dest pê dike. Ji bilî dubarekirina danûstandina kurt a sûcan, heqê we ye bêdeng bimînin, hûn ê agahdar bibin ku:

- Renge hûn daxwza bikin hemû pirs û hemû bersiv bi peyvên we bixwe werin tomarkirin;
- Lêkolîneka taybet were krin yan kesekî taybet were hevpeyvînkrin
- Gotinên we yên hemberî dadgehê wekî belge bi kar tên.
- Hûn girtî nînin û her kingê hez bikin dikarin bi serbestî biçin.
- Li dema hevpeyvînê, hûn dikarin belgeyên xwe bi kar bînin lê ev divê nebe sebeba dirêjbûna hevpeyvînê. Hûn dkarn piştî yan dema hevpeyvînê daxwaz bkin ew belge li gotara hevpeyvînêya polîs zêde bbe yan bdin beşa tomarêya dadgehê

5. Li dawiya hevpeyvînê

Li dawiya hevpeyvînê, ew ê nivîsa hevpeyvînê bidin we ku bixwînin. Renge hûn daxwaz bikin kesek bo we bixwîne.

Ew ê ji we bipirsin gelo tiştek bo guherînê yan zêdekirinê heye yan na.

6. Arîkariya wergêr û heqê wergera nivîskî

- Eger hûn ziman fam nakin an napeyivin, yan astengiyên we yên bihîstinê û axaftinê hebin ew ê gazî wergêrekî sondxwarî bikin ku dema hevpeyvînê arîkariya we bike. Ev arîkarî belaş e.
- Renge ji we bixwazin gotinên xwe bi zimanê xwe binivîsin.
- Eger hûn nikaribin zimanê dozê fam bikin, mafê we heye ku hûn beşên têkildar ên destûra binçavkirinê, gazîkirinê û biryara dadgehê li zimanekî ku hûn jê fam bikin bidin wergerandin. Ev alîkarî bêpere ye.

Hûn dikarin vê şiroveya heqên xwe xwedî bikin.